

nûbihar

Mehnameya Çand û Huner û Edebiyat


Hejmar: 2

Sal: 1

Çiriya Paşin 1992

Biha: 8.000 TL.

Nezanî bîndestî ye, zanîn rizgarî ye!





Xwedi
(Sahibi)

Mahmut Yarlug

Berpirsiyarê Gişti
(Genel Yayın Yönetmeni)

Sabah Kara

Berpirsiyarê Nivîsaran
(Sorumlu Yazışları Müdürü)

Süleyman Çevik

Mudîrê Dezgahê
(Müessese Müdürü)

M. Arifoğlu

nûbihar kovareke
mehanî ye ku bi weşandina
karpêkên çanda Kurdî bi
mana tevayî dilebîke.

Raman û rayên xwedyên
karpêkan, lîzûmen ne raman
û rayên *nûbihar* in. Nivîsarên
ku bi îmzeya Berpirsiyarê Gişti
weya bi navê *nûbihar* tèn
weşandin raman û raya
nûbihar nîşan didin.

nûbihar di serrastkirina
karpêkên şandî de azad e.

Bedela abonetiya salinî:
(12 hejmar)

Li hundir: 90.000 TL.

Li derve: 40 DM.

Jimareyên hesabbankî:

Li hundir: Süleyman Çevik,

İş Bankası Yavuzselim

Şubesi, 1079-300-235999

Li derve: Süleyman Çevik,

İş Bankası Yavuzselim Şubesi,

1079-30100-3118770

Navnîşan (Adres):

Fevzipaşa Cd. Başhoca Sk. 49/1

Fatih-İstanbul

Tel: 533 75 88

Berg:

Dönüş

Çapxane:

Mutlu Ofset

بِسْمِ اللَّهِ الرَّحْمَنِ الرَّحِيمِ

nûbihar

Mehnameya Çand û Huner û Edebiyat

Hejmar: 2, Sal: 1, Çiriya Paşin 1992

Pêşgotin / 3

Hejmara duyemîn

Sernivîsar / 5

Nezanî bîndestî ye, zanîn rizgarî ye! / *Sabah Kara*

Ayetname / 8

Çend ayetin ji Qur'an a Mecîd / *Azad*

Hedîsname / 10

Xutbeya xatirxwestiniya Pêxember ê Ekrem / *Süleyman Çevik*

Helbest / 12

Ismê te ye mektûbî di dîwanî qîdem da / *Mela Ehmed ê Cizîrî*

Nivîsar / 13

Nivîskaran û Seîd ê Kurdî / *Xwedêperest*

Helbest / 14

Wer bibîn eşq bi mi çi kir / *Yûnis Emre - Hozan*

Nivîsar / 15

Korekor bûn, ya nebûn; eve hemû pîrsgirêk! / *Sabah Kara*

Nivîsar / 19

Nezanî bes e! / *Süleyman Çevik*

Qise / 20

Îdo / *Bager*

Weşanname / 21

Rîsaleya Biratîyê / *Naci Abdullah*

Helbest / 22

Nameyên bê cewab / 1, 30 Îlon 1990 / *Sabah Kara*

Berhevok / 23

Peyivên rastan

Zarokname / 24

Ko zivistan çû, bihar tê / *Siyawêş Kîsrayî / Sabah Kara*

Karpêkê şandî

Bi navê Yezdan / *Heqperest / 26*

Daxwaz / *Ebdillah Amed / 26*

Kovara nûbihar / *M. Şakir ê Koçer / 26*

Rîde tod, vilî abyenê / *Muhammed Paşa / 27*


Hey Melekent / *Necip Yüce / 27*

Raya me / *Muhammed Paşa / 28*

Rêzîman / 29

Elfabeya Kurdî

Ferhangok / 31



Hejmara Duyemîn

HAN, hejmara duyemîn a kovara *nûbihar*! Bi umêda hejmarên bê nîhayet û pêşveçûna bê nîhayet, heta roja qiyametê! Bi wê umêdê ku ev ala hêşîna bihara ku me vekir, ji destê yekî bibuhure destê yê din û hergiz nekeve, hergiz bi paş de neçel!

Xwendevanên delal!

Hun dê di vê hejmarê de jî, weke hejmara ewil, pêşî **Pêşgotin** ê bixwînin. Em dê di her hejmarê de, di vê beşa kovarê de, bi we xwendevanên delal re hinek sohbet bikin, hejmara nû ya *nûbihar* bi we bidin nasandin û projeyê nû yên xwe teqdim bikin.

Piştî **Pêşgotinê**, hun dê di **Sernivîsarê** de ji **Berpirsiyarê Giştî** yê me mijara esliya vê hejmarê, yanî mijara **nezanî û zanînê**, bi navê **Nezanî bindestî ye, zanîn rizgarî ye!** bixwînin.

Di vê hejmarê de jî, di bin serlewheya **Ayetname** û sernivîsa **Çend ayetin ji Qur'an a Mecîd** de, hun dê meala ayatê 26 îla 50 yê Sûreta Beqere bixwînin. Ayata, brayê me **Azad** diwergerîne.

Îcar di bin serlewheya **Hedîsname** de **Xutbeya xatirxwestiniya Pêxember ê Ekrem** heye. Vê xutbeya giring, brayê me **Süleyman Çevik** wergerand.

Em dê di her hejmarê de teberruken helbestek ji hekîm û şairê delal **Mela Ehmed ê Cizîrî** biweşînin. Di vê hejmarê de helbesta **İsmê te ye mektûbi di dîwanî qidem da** heye.

Brayê me **Xwedêperest** bi nivîsara xwe

Nivîskaran û Seîd ê Kurdî şadî dide vê hejmara me.

Û wergêra helbestekê ji **Yûnis Emre: Wer bibîn eşq bi mi çi kir**. Vê helbestê brayê me **Hozan** ji Tirkî wergerand. **Hozan**, di hejmara ewila me de jî helbestek ji **Muhammed Akif** wergerandibû.

Brayê me **Sabah Kara** bi nivîsara xwe **Korekor bûn, ya nebûn; eve hemû pirs-girêk!**, mijara esliya vê hejmarê, yanî mijara **nezanî û zanînê** tekmîl dike. Û ev tekmîl, bi nivîsara brayê me **Süleyman Çevik** a **Nezanî bes e!** dom dike.

Û qiseke delal ji brayê me **Bager: Îdo...**

Beşa **Weşanname** ya vê hejmarê, brayê me **Naci Abdullah** hazir kir. Navê nivîsara wî **Rîsaleya Bratiyê** ye ku tê de wergêra Kurdî ya **Uhuvvet Risalesi** ya **Bedîuzze-man Seîd ê Norsî** rexne dike.

Û helbestek ji **Sabah Kara: Nameyên bê cewab / 1**

Berhevok di bin sernivîsa **Peyivên rastan** de di vê hejmarê de jî dom dike û dê di hejmarê me yên hatî de jî dom bike însaallah.

Zarokino! **Zarokname** ya vê hejmarê ecêb xweş e! Em bawerin ku hun dê pîrr bicibînin. Îcar navê çiroka me **Ko zivistan çû, bihar tê ye**. Em ji we pîrr hez dikin; loma em dê di hejmarê hatî de jî çirokine pîrr delal teqdimî we bikin.

Û beşekê pîrr giring... Beşa **Karpêkên Şandî**. Em dê di vê beşê de karpêk û nameyên xwendevanan biweşînin. Bila di bîra we de be: Em li benda nameyên we ne.

Jibîr nekin ku dê çand û huner û edebiyata Kurdî li ser piyên me bilind bibe.

Di vê hejmara me de hun dê di bin serlewheya **Karpêkên Şandî** de nameyek ji bra **Heqperest** û helbestin ji brayên **Ebdillah Amed, M. Şakir ê Koçer, Necip Yüce** û **Muhammed Paşa** bixwînin. Helbesta bra **Muhammed Paşa** bi zarava Zazakî ye.

Di beşa talî de **Rêziman** û **Ferhengok** hene. Ev beş dê di hejmarên hatî de jî hebin.

Em di vê hejmarê de **karta abonetiye** didin. Kesên ku dixwazin bibin aboneyên **nûbihar**, dê ji vê kartê îstîfade bikin.

Me ji bo hejmara hatî û pê de, ji bona tesbîtkirin û weşandina ray, raman û pêşniyarên sazûmanan û zanyar û rewşenbîran di heqê "Pirsgirêka Kurdan" de **lêpîrsînek rêk xistiye**. Em lava dikin ku xwendevanên me, **pirsiyarên lêpîrsîna** me **bibersivînin** û **bersivê xwe rê bikin navnîşana** me. Metna vê lêpîrsîne li jêr e:

Axacan (Sayin):

Kovara me **nûbihar** bi **nêta tesbîtkirin** û **weşandina ray, raman û pêşniyarên sazûmanan û zanyar û rewşenbîran** di heqê "Pirsgirêka Kurdan" de **lêpîrsînek rêk xistiye**. Ji **kerema xwe** ve van du **pirsiyarên** li jêr di **tixûba** du **rûpelan** de **bibersivîne**. Ji **ber** ku **zimanê kovara** me **Kurdî ye**, em **lava dikin** ku **bersivên** te bi **Kurdî bin**. **Ko tu** bi **Kurdî nizanibî**, **dê bersivên** te ji **teref** me **biwergere** bi **Kurdî**.

(Dergimiz **nûbihar**, teşkilat, bilgin ve ay-



dînarın "Kürt Sorunu"na ilişkin görüş, düşünce ve önerilerini tesbit edip yayımlamak maksadıyla bir soruşturma düzenlemiştir. Lütfen aşağıdaki iki soruyu iki sayfayı aşmayacak bir şekilde cevaplayınız. Dergimizin dili Kürtçe olduğundan cevaplarınızın Kürtçe olmasını rica ederiz. Kürtçe bilmiyorsanız, cevaplarınız tarafımızdan Kürtçe'ye çevrilecektir.)

Pirsiyaran (Sorular):

1- Ray û ramana te di heqê "Pirsgirêka Kurdan" de çîye?

(1- "Kürt Sorunu"na ilişkin görüş ve değerlendirmeniz nedir?)

2- Ji bona hel û fesilkirina ve pirsgirêkê pêşniyarên te çîye?

(2- Bu sorun'un çözüme kavuşturulmasına yönelik önerileriniz nelerdir?)

Bi xwast a silav û kamiraniyê.

(Selam ve başarı dileklerimizle.)

Sabah Kara
Berpirsiyarê Giştî
(Genel Yayın Yönetmeni)

Paşî, em **wacib dibînin** ku **ji bra** û **heval** û **hogir** û **xwendevanên** ku **weşandina kovara** me **nûbihar** bi **wesîleyên** **muxtelif** **tebrîk** **kirin** re **em spas** bikin.

Zor spas! ■

nûbihar

Nezanî bindestî ye, zanîn rizgarî ye!

Sabah Kara


MEREV bi zanînê, bi xwendin û raman kirinê mesûliyeta xwe fam û îdrak dike. Zanîna ku mesûliyeta merev bi wî dide fam kirin, tixûb û hidûdê wê mesûliyetê hin bi hin fireh jî dike. Yanî merev pêşî fam dike ku li ber filan tiştî mesûl e, paşre dibîne û fam dike ku li ber bêvan tiştî jî mesûl e û ev zencîra mesûliyetê wisa hin bi hin dirêj dibe.

Mesûliyet jî, kar û xebat teleb dike. Mirovê ku xwe li ber filan tiştî mesûl dît, ji bona bi cih anîna wê mesûliyetê dixebite. Lêbelê mirovê nezan, ji ber ku mesûliyeta xwe nizane, li ber bûyera şaş û behîtî dimîne, ti tişt jî destê wî naye û di bin barê bindestiyê de dije.

Naxwe sebeba esliya bindestiyê, nezanî ye.

Ez ji we dipirsim: Ko Kurd nezan nebûna, gelo kî karîbû ev çendîn sal in Kurdan di vê bindestiyê de bihêle?

Erê, zilm hebû û heye. Zilmeke dehşetnak li me Kurdan bûye. Me bi zilm û



zordariyê bindest kirine. Me bê welat, bê dewlet, bê hikûmat, bê xwendegeh, bê kitêb, bê rojname û hwd hiştine. Lêbelê ko bedena merev ji naxweşiyê re ne amade be, merev naxweş nakeve. Mîkrob piştî ku cihê xwe hazir dike tête merev; weya wextê ku cihê xwe hazir dibîne tê. Ma gelo ev zilm û zordarî di rokê du roja de li ser Kurdan hakimiyet peyda kir? Helbet na! Roj bi roj, hin bi hin

binê lingê Kurdan kola, he- ta ku ketin xewa nezaniyê de û ji nişka êriş kir.

Gurên zordar û diran bi xwîn, heta ku tava ilm û zanînê di nav xelqê de bû, êriş nekirin. Li benda şevê man. Şev ku hat, pêşî çira tefand in; zana, alim û serokên mîna Şêx Seîd, Seyid Riza û hwd yek bi yek bin erd kir in. Êdî gur, bûn mîrê berxan û sifra bi xwîn li ber wan vebû. Hay wax! Kurdên ku dewletek mîna dewleta Eyûbî teşkîl kirin ku hîç dewletî bi hed û endaza wê dewletê ehemiyet nedaye ilm û zanînê û hîç dewletî bi hed û endaza wê dewletê medrese û xwendegehane nevekiriye, ketin şeveke dirêja nezanî û zilmê de. Hay wax! Seg û guran henekê xwe li şêran kirin û dikin! Seg û guran serê şêran xwarin û dixwin!

Derdê gelê me nezanî ye. Nezanî mîna jengê bi mêjî û dil û ruhê me ve girtiye. Me di vî zemanê pêşveçûna berqasa de şaş û behît hiştîye. Me kiriye dijminê hevû-

du. Me di rêya pêş-veçûnê de li pişt hemû gelan de hiştiye.

Dijminê zana, ji dostê nezan çêtir e. Lewra hun dibînin ku dostê nezan vaye hevûdu dikujin. Bi navê xelasiyê, dostên xwe dikujin.

Serhildan ne karê nezana ye. Ko tu serê vala hilde nehilde çi fêde?! Dê zilm biçê, zilmek din were cih. Lê çûna zilmê ne kafî ye. Gereke zilmek din neye şûna wê zilmê. Garantiya vê jî, zanîn e; bi zanayî qebûl kirin û bi zanayî redkirin e.

Gelê me lazime çi bike bike û deriyê zanîne veke. Mîna ku Melayê Meşhûr dibêje: "Xwendin, xwendin, xwendin!"

Ma ka gelê me ji sedî çend xwendin û nivisandinê zane? Xusûsen ji sedî çend bi zimanê xwe xwendin û nivisandinê zane? Erê, têra xwe behanê me hene. Dijmin mamostayên me kuşt in, xwendegehên me qedexe kir in û girt in, zimanê me qedexe kir in, destûr nedan ku em bi zimanê xwe kitêb û rojname û kovaran biweşînin. Ev hemû qebûl! Lê ma ji îro û pê de?!... Vaye ko bi derd û zehmet jî be kitêbên me hin bi hin çap dibin, rojname û kovarên me hin bi hin dertên. Ma gelo çend hezar mirov, van dixwînin û dê bixwînin? Ma ji bîst û xurde milyona panzdeh bîst



hezar?! Yanî ji sedî deh, ya ji sedî pênc?! Kî kare bêje ev kafî ye?! Naxwe seferberiyê pirr fireh û mezin li ber me ye. Gereke em pirr bixwînin, pirr raman bikin û kevir, zûxûr û şkêran ji erdê çanda xwe bidûr bikin.

Gereke em piştî xwe nedin çanda dijmin û bi werîsê dijmin danekevin çalê. Lewra çawa ku welat û hikûmata dijmin bi her tiştê xwe ve nabin yê merev, çanda dijmin jî tevde nabe ya merev. Lê tiştê lazim û xêr li kû be em dê bigrin. Lewra mîna ku em mensûbê gelê xwe ne, em mensûbê famêla însaniyetê ne jî. Her tiştê qenc û delalê însaniyetê yê me ne. Lê gereke tiştê ku em dê

bigrin, em bi xwe hilbijêrin, ne dîgeran li me bar bikin. Yanî lazime em li ser xwe bin, li ser piyê xwe bin; bi welat bin, bi hikûmat bin, bi çand bin, bi huner bin, bi wîje û edebiyat bin. Wextê ku em ji van merhaleyên derbaz bûn, êdî ti kes nikare li me zilm bike, ti kes nikare me bindest bike. Lewra deveh pirr bi zor e, lê zanîn devehê dide çokandin û bar li pişt dixê.

Lêbelê li vir pirsek têtê pêşya me:

Ma gelo zalim jî ne zana ne? Ma zanabûn bi tenê têra merev dike?

Bersîva vê pirsê hêsan e.

Bersîv di ferqa di nav zana bûn û zanaşeytan bûnê de ye.

Zana kiye, zanaşeytan kiye?

Zana ewe ku ji bona xêr û qenciya gerdûnê dixebite. Zana xwe nas e. Yê ku xwe nas dike, heddê xwe zane. Zana însan nas e, qedirşinas e, mirovhiz e û ji bona xweşbextî û şadiya însan û gerdûn, ji ilm û zanayiyê îstîfade dike. Bi pêş de diçe û însanan jî bi xwe re bi pêş de dibe. Ji zanayiya xwe sûtîstîfade nake. Li gor zanîna xwe dije. Wextê ku îznê nedinê ku wisa bije, mîna Sokrates, giyajehrînê tercîh dike.

Zana heddê xwe zane. Çiqas di rêya zanayiyê de bi

pêş de here, ewqas bi nezaniya xwe hîn dibe û dibêje: "Tiştê ku ez zanim ewe ku, ez tiştekek nizanîm." Weya dibêje: "Tiştê ku ez zanim, dilopek ji behra zanayiyê ye." Loma ji hed derbaz nabe. Dilnizm e û di halê xwe de ye. Wextê rastiyekek peyda dike nabêje: "Rastiya mutleq ev e; min rastiya mutleq peyda kir!" Hebe nebe dibêje: "Tiştê ku ez ragehiştimiyê ev e. Heta ku ez tiştekek jê rasttir peyda bikim, rastî ev e."

Zana tiştekekî korekorane qebûl û red nake. Yê ku tiştina korekorane qebûl ya red dike, ne zana ye; hebe nebe, ferzane ye, yanî 'uqala' ye.

Zana, tiştê ku ji xwe re dixwaze, ji hevalê xwe re jî dixwaze û tiştê ku ji xwe re naxwaze, ji kesî re naxwaze. Xêr û qenciyê ji herkesî re dixwaze, şer û neqenciyê ji kesî re naxwaze. Naxwaze ku lê zilm bibe, loma naxwaze ku li kesî zilm bibe. Dixwaze ku bi rûmet û bi şeref bibe, loma dixwaze ku herkes jî wisa bibe.

Lêbelê halê zanaşeytan ber eks û dijî zana ye. Rast e ku zanaşeytan jî 'zane', lê zanîna wî ne ji bona xêr û qenciya însan û gerdûn e.

Zanaşeytan ne xwenas e. Loma heddê xwe jî nas nake û nizane. Ne însan nas e. Eslen li gor ramana wî ti qîmeta însanên din tuneye ji bil şexsê wî. Loma qedrê

ti kesî û ti tiştî nizane. Ji ti kesî û ti tiştî hez nake ji bil nefsa xwe. Ko ji kesî ya tiştî hez bike, ji bona nefsa xwe û îstîfada xwe jê hez dike. Ji zanayiya xwe dijî însanan û gerdûn îstîfade dike. Ji bona bedbextî û neşadiya însaniyetê dixebite. Meselen bombeya atomî îcad dike, da ku jîndar pê mehf bibin.

Zanaşeytan bi xwe roj bi roj bi paş de diçe û dike ku yên li dormandorê wî jî bi paş de biçin. Yanî mîna şeytan, ji zanayiya xwe sûtîstîfada dike.

Zanaşeytan eslen heddê xwe nizane. Li dijî zana, zanaşeytan xwe her tiştî zane qebûl dike. Ferhengê wî bi "ez" dest pê dike û bi "min" temam dibe. Li gor ramana wî, tasek av a wî kare tofana Nebî Nûh pêk bîne. Tiştê ku zane ewe ku, ew her tiştî zane! Loma, hed û tixûb nas nake. Dilnizmiyê û di halê xwe de bûne, zillet hesab dike. Wextê rastiyekek derewîn peyda dike, dibêje: "Han! Rastiya mutleq! Min rastiya mutleq peyda kir!"

Zanaşeytan tiştê ku dicibîne korekorane qebûl dike û dixwaze ku herkes jî qebûl bike; û tiştê ku nacibîne korekorane red dike û dixwaze ku herkes jî red bike.

Serokên "Îstiklal (!) Mahkemeleri" ji nav zanaşeytan derdikevin. "Qanûn (!) ê Dêrsimê" karpêkên van

cins zanaşeytan in.

Zanaşeytan bi qasî ku li ber dîktatorên mîna dîktatorê me yê nav nelazim çaplûsiyê dîkin, li hemberî belengaz û xizan û musted'efên nav malûm, mustekbirî û bêvilmeziniyê dîkin.

Zanaşeytan tiştê ku ji xwe re dixwaze, ji dîgeran re eslen naxwaze û her tiştê ku ji xwe re naxwaze, ji dîgeran re dixwaze. Me ew zanaşeytanên malûm, dixwestin ku ew jî di "Îstiklal (!) Mahkemeleri" de daraz û muhakeme (!) bibin?! Ma qey zanaşeytan, sifra tişê ara û kerafiya Çankaya dihêle û dimre?! Ma qey mêjiyê neçîzê xwe kirye "yarim ekmek arası"?!
* * *

Zanaşeytan her xêr û qenciyê, ji xwe re; her şer û neqenciyê, ji yê din re dixwaze. Naxwaze ku zilm lê bibe, lêbelê dixwaze ku li her kesî zilm bibe; ji bil yên ku kêfa wî ji wan re tê û dilê wî bi xizmeta wan şa dibe.

Naxwe dê çawa rizgarî ji zanîna zanaşeytan û uqala biwelide?! Ma qey ji hêka qaj, kevok hîç der tê?!
* * *

Ela kullî hal, hun guh bidin peyiva min:

Nezâ:î bindestî ye,

Zanîn rizgarî ye! ■

Çend ayetin ji Qur'an a Mecîd

Azad


SÛRETA BEQERE
(:MANGE)

*Bi navê Xweda yê
arîkarîxwaz û
bimerhamet.*

26- Xweda ji mîsal da-
na pêşiyekê weya tiştêk
jê bilindtirî, xwe nade alî.
Yên ku îman anîne zanin
ew mîsal heqqek ji tere-
fê Rebb ê wan e. Lê ka-
fir dibêjin ku "Meqseda
Xweda ji vê mîsalê çi
ye?" Ew pê gelean şaş
dike û gelean jî dighîne
hîdayetê. Lê ji bil fasiqan
û yê ku ji rê derketine, ti
kesî şaş nake.

27- Ew ên ku piştî qe-
bûlkirina xwe ya qet'î, eh-
da Xweda dişikînin û tiştê
ku Xweda ferman kiriye
ku bighe Wî, ji Wî dûr di-
kin û di serzemîn de
fesadê derdixin. Bizanin
ku evan di ziyane de ne.

28- Hun çawa Xweda
înkâr dikin ku hun mirî
bûn, Wî we jînde kir û dê
we cardin bimirîne û car-



din jînde bike û hun dê
vegerin nezda Wî?

29- Ew e yê ku her
tiştê ku di serzemîn de
ne ji we re xuliqand. Yê
ku paş re berê xwe da
ezman (:lê îstîwa bû) û
kire heft semawat Ew e.
Ew her tiştî zane.

30- Wextî Rebb ê te ji
ferîşteyan re got: "Ez dê
di zemîn de xelifekî bi-
xuliqînim." Got in: "Ma Tê
li wir kesî bixuliqîni da ku
tê de fesadê derxe û
xwîne birjîne? Vaye em
Te tazîm dikin û ji Te re
tesbîhatê dikin û em Te
teqdîs dikin." Got: "Tiştê

ku Ez zanim, hun niza-
nin."

31- Ê navê tiştan bi
Adem da elimandin. Paş
re wan ji ferîşteyan pirsî
û got: "Heger hun rast
dibêjin, ka navê van ji
Min re bibêjin?"

32- Got in: "Tu munez-
zeh î. Ji bil tiştê ku Te bi
me daye elimandin, ti
ilmê me tineye. Zana yê
hekîm, Tu yî."

33- Got: "Ey Adem,
wan bi navên wan tiştan
xeberdar bike." Wextê ku
wan bi navan xeberdar
kir, (Xweda) got: "Ma Min
ji we re no got 'Ez nîhanê
(:xeybê) semawat û erdê
zanim û her tiştê ku hun
êşkere dikin weya dive-
şêrin Ez zanim'?"

34- Ê Me ji ferîşteyan
re got: "Ji Adem re secde
bikin." Hemû secde kirin,
ji bil Îblîs, ku înad kir û
dawa mezinayiyê kir û bû
ji kafiran.

35- Ê Me got: "Ey
Adem, tu û jina xwe di
bihiştê de bijin û li her

derê ku hun dixwazin her tiştê ku hun dixwazin bixwin, lê bi vê dara ha nêzîk nebin, ku hun dê daxilê zumreya zaliman de bin."

36- Lê şeytan wan avête xetayê û ji bihişta ku tê de bûn, wan bider kir. Me got: "Herin jêr, hin dijinê hinê din bin û heta wextekî mûeyen, cihê we û meta'a we di zemîn de ye."

37- Adem ji Rebb ê xwe peyivin stand û pişt re (Xweda) toba wî qebûl kir; lewra Ew tobe qebûlvana e û bimerhamet e.

38- Me got: "Hemû jê (:ji bihiştê) herin jêr; lê wextê ku ji canibê Min ji we re hîdayetek hat, yê ku bibin tabî'ê hîdayeta Min, ji wan re ne tirs heye û ne jî dê mahzûn bibin."

39- "Û yê ku bibin kafir û ayatên Me tekzîb bikin, ewan ehlê agir in û wê tê de îlelebed bimînin."

40- Ey Benî Îsraîl, nîmeta ku Min bi we daye



bînin bîra xwe û bi ehda Min wefadar bin, da ku Ez jî ehda we bînim cih û bi tenê ji Min bitirsin.

41- Û bi tiştê ku Min ji we re nazil kiriye (:Qur'an) ku tiştê li cem we (:Tewrat) tesdîq dike, îman bînin. Nebin ewilîn kesên ku wê (:Qur'an) înkâr dikin û ayatê Min bi bedeleke neçîz nebedilînin û bi tenê ji Min bitirsin.

42- Heq û batil tevîhev nekin û piştî ku hun zanin, heq neveşêrin.

43- Bi rastî nimêj bikin, zikat bidin û bi rikûvanan re hun jî rikû'ê bikin.

44- Ma hun qencyê li mirovan emir dikin û hun xwe jibîr dikin (hun qencyê nakin)? Hun kitêbê jî dixwînin. Ma hun aqil nabin?

45- Bi sebr û nimêjê, arîkariyê bixwazin. Ev, tişte zehmet e, ji bil ji ehlê xuşû'ê re.

46- Ew ên ku zanin ku bê şik, bi Rebb ê xwe dê rûbirû bînin û dê vegerin cem Wî.

47- Ey Benî Îsraîl, nîmeta ku Min bi we daye û Min we (di çaxekî de) ji xelqên din bilindtir kiriye, bînin bîra xwe.

48- Xwe ji wê rojê biparêzin ku ti kes ji dêvla yê din nikare ti tiştî bide û şefaeta ti kesî qebûl nabe û jê fîdye naye standin û ji ti kesî arîkarî naye.

49- Bînin bîra xwe ku Me we ji destê Fir'ewniyan xelas kir ku şkençeyên bê hed û hesab li we dikirin û lawikên we serjêdikirin û jinên we dihiştin. Di vê de îmtîhaneke mezin ji we re heye ji Rebb ê we.

50- Û (bînin bîra xwe ku) Me behrê ji we re qelaşt, Me we xelas kir û Me Fir'ewniyan li ber çavê we xerq kir. ■

Xutbeya xatirxwestiniya Pêxember ê Ekrem

Süleyman Çevik

EY mirovino!

Gotina min baş guhdarî bikin! Ez nizanim, dibe ku piştî vê salê car-din em hevûdu nebînin.

Mirovino!


Çawa ku ev rojên we rojên muqedes in û ev mehên we mehên muqedes in û ev bajarê we (Mekke) bajarek muqedes e, wisa jî canê we, malê we û namûsa we muqedes e û ji hemû êrîşan hatiye parastin.

Eshabê min!

Sibe hun dê bigehêjin Xwedê yê xwe û muheqeq hun dê ji hal û hereketên xwe mesûl bibin. Zînar li dû min ne-vegerin şaşîtiyên xwe yê berê û hevûdu nekujin. Kesên ku li vir in bila vê şîreta min ji yên ku ne li vir in re bibêjin. Dibe ku kesên ku ne li vir in û bibhîsin, ji yên ku li vir in û guhdar dikin xweştir fam bikin û biparêzin.

Eshabê min!

Li cem kî emanetek hebe bila bide xwedî.



Her cûr faîz hatiye rakirin û di bin lingê min de ye. Lêbelê gereke hun deynê xwe yê eslî bidin xwedî. Ne zilmê bikin û ne jî zilmê bibînin. Bi em-rê Xwedê, êdî faîzkerî qedexe ye. Ev adetên nebaş ku ji dewra cehaletê ve mane hemû di bin lingê min de ne. Ewilîn faîza ku min sifte rakiriye jî, faîza Ebbas ê kurê (apê min) Ebdilmuttelîb e.

Eshabê min!

Dozên xwînê yê ku di dewra cehaletê de hatine ajotin hemû hatine rakirin. Ewilîn doza xwînê ya ku min sifte rakiriye jî, doza xwîna Rabîe ya neviya (apê min) Ebdil-

muttelîb e.

Ey mirovino!

Îro şeytan di vî diyarê we de qeweta avakirina tasîr û hakîmiyeta xwe ji niha şûnde heta ebedê wenda kiriye. Lêbelê ger hun ne di tiştên ku min rakirine de, di tiştên ku hun piçûk dihesibînin de be jî tabiyê şeytan bibin, ev dê wî dilşad bike. Ji bo parastina dîne xwe, xwe ji wan tiştan jî biparêzin.

Ey mirovino!

Bi mafê jinan rîayet bikin û ez şîret dikim ku di vê derbarê de ji Xwedê bitirsin. We jinan ji Xwedê bi emanetî girtiye, we namûs û îfeta wan bi navê Xwedê soz daye û we wan ji xwe re kiriye helal. Mafê we li ser jinan heye û mafê jinan jî li ser we heye. Mafê we yê ku li ser jinan heye ewe ku, kesên ku hun ji wan hez nakin, lazime ku jinê we wan kesan nestînin mala we. Heger jinê we kesên ku ji bo hatina mala we ji

we destûr ne-girtibin têxin mala we, wî wextî lê-daneke sivik li jinê xwe kin û wan ji vê rêyê vegerînin.

Mafê jinan yê ku li ser we ye jî ewe ku, li gor adetên dinyayê tamîn kirina her cûr îhtiyacên wan e.

Ey mûminan!

Ez ji we re emanetek dihêlim ku ko hun xwe pê ve girêdin, hun rêya xwe tew şaş nakin. Ev emanet, kitêba Xwedê Qur'an e.

Mûminino!

Gotina min baş guhdar bikin û xweş fam bikin.

Misilman brayê misilman e. Bi vî awayî misilman tev brayên hev-ûdu ne. Êrîşkirin bi mafê brayê we yê dînê, ji kesî re helal nîne; meger ku ew bi xweşdiliya xwe ve bi we bide.

Eshabê min!

Bi xwe jî zilmê mekin. Mafê we bi xwe jî li ser we heye.

Ey mirovino!

Xwedê Teala mafê her



kesî (di Qur'anê de) daye wî kesî. Ji mafê waris re ne hewceyî şîretê ye. Zarok di doşega kî de çêbibe, yê wî ye.

Ji kesê zînaker re mahrûmiyet heye.

Bê nifşê ku ji bil nifşa bavê xwe li nifşekî din digere û kesê ku ji bil sermiyanê xwe, xwe mensûbî kesê din dike, xezeba Xwedê û laneta ferîşteyan û nifira hemû misilmanan li ser wî be!

Xwedê Teala him toba mirovên wisa û him jî edalet û şahidiya wan qebûl nake.

Ey mirovino!

Rabbê we yek e, bavê we jî yek e; hun hemû zarokên Adem in û Adem jî ji axê ye. Li cem Xwedê yê ku ji we herî hêja ye ewe ku, ji Xwedê pîrr ditirse. Ti mezinayiya Ereb li ser yê ne Ereb nîne, ji bil taqwayê.

Mirovino!

Sibe wê min ji we pîrs bikin; hun dê çi bêjin? (Yên ku guh di-

dan xutbeya Pêxember ê Ekrem, tev de gotin: "Em şahidiyê dîkin ku te pêxemberiya Xwedê kir; te wezîfa xwe bi cih anî; te li me şîret û nesîhet kir." Li ser vê bersîva mûminan, Resûl ê Ekrem tiliya xwe ya mibareka şehadetê bilind kir, paşî vegerend ser cemaetê, ber bi jêr kir û got:)

Şahid be ya Reb!

Şahid be ya Reb!

Şahid be ya Reb! ■

Ismê te ye mektûbi di dîwani qidem da

Mela Ehmed ê Cizîrî

Ismê te ye mektûbi di dîwani qidem da
Herfek qelemî ilmi bi teqwîmi reqem da

Eşkal û xetîn daireî nuqtei ilmin
Ev neqş û misalîn di xeyalati edem da

Mîm metle'i şemsa ehed ayîne sifet kir
Lami' ji Ereb berqi li fexxari Ecem da

Da şahidi esma bi hemî wechi binasîn
Yek mesti semed kir bi yekî neqşi senem da

Yek girtiye zulfî u yekî xali numaî
Ayîne bi'Skenderiyû cami bi Cem da

Erwahi muqeddes şebi qedran te dixwazin
Nûra te ye misbahi di qendîli herem da

Da weqti liqayî bi te hey bin di beqayî
Min neqdi dil'û can di fenayî bi selem da

Yaqût-furûşan di kef elmas şikestin
Ev sefhei elmasi ku neqqaşi reqem da

Ya Reb ji çi rû leb bi senaya Te kuşayem
Subhaneke len uhsiye fî şe'nike hemda

Minnet ji Xudayî ku bi ebdî xwe Melayî
Iksîri xemî işqi ne dînar u direm da

Nivîskaran û Seîd ê Kurdî

Xwedêperest

Li ser Seîd ê Kurdî pîrr nivîs hene. Ez karim bibêjim di vê dewrê de kesê herî pîrr li ser wî nivîs û pirtûk hatine nivisandin, Seîd ê Kurdî ye. Lewra kesên ji her fikrî, li ser wî nivisandin.

Han, navên gend pirtûkan:

Şerif Mardin, *Bediüzzaman Said Nursi*; Rohat, *Unutulmuşluğun Bir Öyküsü: Said-i Kürdî*; Malmîsanîj, *Said-i Nursi ve Kürt Sorunu*; Ursulu Spuler, *Nurculuk*; Prof. Gotthard Joschke, *Bediüzzaman Said Nursi*; Ruşen Çakır, *Ayet ve Slogan*; Uğur Mumcu, *Said-i Kürdî*; Serhat Hürkan, *Saidi Nursi'nin Mezarı Nerede*; Tarık Zafer Tunaya, *Türkiye'de Siyasi Partiler* (cild 1-2); Ekrem Cemil Paşa,



Muhtasar Hayatım; Necmeddin Şahiner, *Bilinmeyen Taraflarıyla Said Nursi*; Cemal Kutay, *Çağımızda*

Bir Asr-ı Suadet Müslümanı: Bediüzzaman; Abdülkadir Badıllı, Bediüzzaman Said-i Nursi; Ihsan Işık, Bediüzzaman Said Nursî ve Nurculuk û hwd.

Vana yên ku niha di bîra min de ne. Hê deh ewqas pirtûk û nivîs û kovar û rojname hene.

Hunê bêjin, "Temam, me fam kir ku pîrr nivîs hene. Armanca te çiye? Wê bibêje."

Armanca min eve: Her çiqas nivîs û pirtûk hene, lê ez karim bêjim ji sedî nod û neh evan zanyarane nehatine nivisandin. Her xwedî ramana, li gor ramana xwe, yan Seîd ê Kurdî mezin kiriye û kiriye hemramanê xwe, yan jî heta jê hatiye wî piçûk kiriye û

wî dijmin daye nîşandin.

Ev nivîsên wisa, ne rastin. Xwendevan di bin bandûra van nivîsan de Bedûuz-zeman Seîd ê Kurdî rast nas nakin û doza wî hîn nabin.

Mînak: Kesê ku hê Seîd ê Kurdî nas nake, ko pirtûka Malmîsanij bixwîne, ewê Seîd ê Kurdî dijminê Kurdan bizanibe.

Ko nivîsa Uğur Mumcu bixwîne, ewê Seîd ê Kurdî dijminê Tirkan bizanibe.

Ko pirtûka Cemal Kutay bixwîne, ewê wî yekî ku doza Tirkiyê dajo bizanibe.

Ko nivîsê rojnameya *Welat* bixwîne, ewê wî yekî ku doza Kurdîtiyê dajo bizanibe.

Han ji we re çar ramanên li ser Seîd ê Kurdî û çar Seîd ê Kurdî yê berevajiyê hev! Hun dibînin ev çiqas bûyerek bikenn e; ne wisa?

Ko hun bibêjin "Emê Seîd ê Kurdî çawa rast binasin?"

Ezê bêjim: Pêşî eklekî îslamî (ne nijadperestî) bigrin serê xwe, pirtûkên Seîd ê Kurdî (yên ku rast hatine çapkirin) hemûyan lib lib bixwînin.

Di dermafê (derheq-qê) çî de, kengê, ji kê re, çî gotiye bizanibin û wî bi vî awayî ji pirtûkên wî binasin...

Ez ji we lava dikim, ko hun dixwazin Seîd ê Kurdî nas bikin, bi vî awayî nas bikin.

Ê ku dixwaze pirtûkên din jî bixwîne, bila pirtûkan bide ber hev (muqayese bike) û bi vî awayî bixwîne.

Ey kesên ku li ser Seîd ê Kurdî dinivîsin! Êdî bese; vî mirovê mezin nexin pardarê (şîrîkê) raman û dîtinên xwe yê çewtî (xeletî)! Ko hun wisa dom bikin, nîfşê (neslê) niha ewê sibe tûke ser çavên we.

Em êdî Bedûuz-zeman Seîd ê Kurdî baş nas dikin. Em zannin ku ew ne dijminê gelê xwe bû û ne jî nijadperest bû.

Ew li gor Qur'anê û sunneta Pêxember dilivîya û ji bo hemû mirovan dixebitî. Lêbelê bi taybetî, ji bo ummeta îslam; û dîsa bi taybetî, ji bo gelê xwe, gelê Kurd dixebitî û hetanî hilma (nefesa) xwe ya paşî jî, jiyana xwe wisa dom kir.

Tu her bijî ey

Melayê Meşhûr! ■

Wer bibîn eşq bi mi çî kir

Yûnis Emre
Werger: Hozan

Mi dil daye vê sewdayê
Wer bibîn eşq bi mi çî kir
Mi ser daye vê dawayê
Wer bibîn eşq bi mi çî kir

Ez digrîm bi ax û fixan
Eşq pare kir ser û dilan
Ne aqil im û ne dîwan
Wer bibîn eşq bi mi çî kir

Ez weke mecnûn midhişim
Dost di xewê de dibînim
Hişyar ku bûm melûl dibim
Wer bibîn eşq bi mi çî kir

Eşqa te ez sermest kirim
Dilê mi girt naxweş kirim
Qest kir da ku ez bimirim
Wer bibîn eşq bi mi çî kir

Geh ez weke ba diweşim
Geh ez weke rê diheşim
Geh lehîme diherikim
Wer bibîn eşq bi mi çî kir

Ez weke çem diherikim
Ji dilê xwe dişewitim
Yar re digrîm diqehirim
Wer bibîn eşq bi mi çî kir

Çavê mi şil madê mi zer
Beden pare cîgerem ser
Ho hemderdo ho brader
Wer bibîn eşq bi mi çî kir

Ez Yûnis ê bêçare me
Ji ser ta pa ve pare me
J'diyarê yar aware me
Wer bibîn eşq bi mi çî kir

Korekor bûn, ya nebûn; eve hemû pirsgirêk!

Sabah Kara

KOREKOR (dogim, dogmatîk, yobaz) bûn, bê peyda kirin, xwe peyda kirî qebûl kirin e.

Korekor xwe li pişt *mutleq bûna heqîqetê* diveşêre û pişt xwe dide *rastiya xwe ya şexsî* ku tevî ku ne rast e, lêbelê ew bi xwe wê rast qebûl kiriye û bi vî awayî mirovên din daraz dide û mehkûm dike; ji ber ku *îzafî bûna rastiyê* nizane, *rastiya xwe heqîqet* qebûl dike û *rastiyên mirovên din, ji heqîqetê biderve* dihesibîne.

Çi ferq di nav *rastî û heqîqet* de heye û mana *îzafî bûna rastiyê* çiyê?


Pêşî bi tesbîtekê emê rewşenî bidin vê pirsê:

Heqîqet, *rastiya mutleq* a azad û rizgar ji meyl û hêjandin û dîtin (nezer) û vekolîn (tefsîr) ên cûrbecûr (muxtelif) ê mirovên cûrbecûr e.

Meselen *jiyan*, yekî ji van *rastiyan* e. Lewra meyl û hêjandina mirovên cûrbe-

cûr çibe bila bibe, *jiyan heye û rast* e. Naxwe *jiyan heqîqet* e. Lêbelê meselen *jiyana wilo* weya *wisa*, yanî şiklê *jiyana mewcûda mirovan, ne heqîqet* e; hebe nebe *rastiyek ji rastiyan* e. Lewra di heqqê vê meselê de, yanî di heqqê şiklê *jiyanê* de bîr û baweriyên *mirovan* dibe ku ji hev bidûr be û ne weke hev be. Her kes kare li gor dîtin (nezer) û baweriyaya xwe, li gor ray û hêjandina xwe bije û şiklê *jiyana xwe rast* qebûl bike.

Mîsalê vê meselê pîrr in;




em karin gelek mîsalan zikir bikin. Mîsalek ji van mîsalan jî, şiklê *dîtina tiştan ê miyob* (kurtbîn) û *yê ne miyob* û ferqa di nav *tesbît û rastî* qebûl kirina tiştan ên van diduyan (*miyob û ne miyob*) e.

Miyob, *tiştên li dûr* qenc û net nabîne; *lêbelê yê ne miyob*, wan *tiştan* qenc û net dibîne. Loma *têgehîştin* (telaqqî) û *rastî* hesab kirina van du *mirovan* di heqqê wan *tiştan* de ne weke hev e û ji hev bidûr e. Eve, em ji van cins *rastiyan* re dibêjin *rastiyên îzafî*. Lêbelê ti kes nikare bêje "*Jiyan tuneye*." Lewra hebûna *jiyanê rastiyeke mutleq* e. Li gor her kesî *jiyan heye*. Loma em ji van cins *rastiyan* re jî dibêjin *rastiyên mutleq* weya *heqîqet*.

Eve, ferqa esliya ku di nav *şexsê korekor* û *yê ne korekor* de ye jî di vir de ye; *lêbelê* bi ferqekî pîrr girîng: *Korekor* (dogim, yobaz), *miyobek* e ku nizane ku *miyob* e. Loma, raman û dîtînen xwe, *rastiyên mut-*

leq weya heqîqet qebûl dike û fikr û dîtînên mirovên din, batil û ne rast hesab dike. He-la wextê ku korekor qewî û xwedî îqtîdar û bi pişt be, her tiştê ku dij û muxalifê dîtina miyobiya wî be, mehkûm dike û ji kesên ku heq û heqîqetê mudafa dikin û diparêzin re dinyayê dike zîndan û cehenem.

Her kes tiştina zane; her kes li gor dîtîn, fam kirin û hêjandina xwe, xwedyê rastine xasî xwe ye. Lêbelê halê korekor li vir jî ferqîti erz dike: Korekor xwe her tiştî zane hesab dike! Ser de jî, her tiştê ku zane, rasteke mutleq e jî! Heddê kiye ku jê re bêje 'Tu ne rast difikirê!' Ji korekor xelet nikare sadir bibe! Heger hun ji korekor çêtir dibînin û fam dikin, way bi halê we! Îdî ji mirinê mirin biyecibînin! Ma hunin ên ku ji korekor çêtir dibînin?! Hêdî naxwe! Kefenê ku korekor ji we re hazir kiriye tam li gora bej-na we ye! Axacan, hun 'rêşas' in, hun 'rastiyê diveşêrin', hun 'pirole û



bêhed' in, hun 'modernîst' in, hun 'ne di rêya bav û bapîrê xwe de' ne û hakeza!

Welat, nijad, meslek û îdeolojiyeke xasê korekoran tuneye. Korekor di her welatî de dijîn, di her nijadî de mewcûd in, di her meslek û îdeolojiyî de tèn dîtîn. Korekorê her welatî, her nijadî, her meslekî û her îdeolojiyî henin.

Korekor hêsanvan e, şablonvan e. Ro ji serê wî derhatiye û di bin payên wî de çûye ava! Her tişt ji korekor tête pirsîn! Korekor xwedyê mutleqê her tiştî ye! Heger îdeolojiya korekor û hewe yek xuya be, ew hirkur e, hun zirkur in! Ew îdeolojî pêşî ji wî tête pirsîn! Heger

ramaneke we hebe, berî ku hun ji kesên din re bêj in, pêşî gerek hun ji wî ferman bixwazin û izna wî bistînin! Korekor, bi navê xwedyê heqîqî bûna wê îdeolojiyê, we bi bêrehmaneterîn şiklî daraz dide û mahkûm dike. Ji xwe, ji korekor li benda dilovanî, evîn, xoşdîtînî û dad man, bê mana û beyhûde ye. Lewra korekorî, qeşa girtin e, cemad e; lê dilovanî, evîn, xoşdîtînî û dad; rehmet in, baran in. Agirê korekoriyê û barana rehmetê eslen li hev nakin. Lewra rehmet, wî agirî ditefîne, kokê korekoriyê hişk dike û weke Mesîh, koran bi çav dike.

Ji korekor re tiştêk îzah kirin, ji derbaz kirina de-

vehê ji xendeqê bi zehmet-tir e. Lewra korekor, zane! Korekor, peyda kiriye! Lêbelê di heqîqetê de wî bela xwe bi tenê peyda kiriye, ne tişteki din. Li tişteki nagere! Dê çima bigere?! Peyda kiriye ew! Him bê zehmet û bê ger peyda kiriye! Tiştê ku hun dibêjin, bi şablona ku di serê xwe de ye dipîve. Korekor eslen nabêje 'gelo?', 'ma dibe?', 'eceba?', 'ka em mêzekin!' Muhtelayê rengkoriyeke ecêb e korekor. Di dîtina wî de her tişt yan spî ne, yan reş. Dev ji tonên rengan biqerin, di nezeza korekor de ji bil spî û reş ti rengê din tune ye. Bi serde jî, ne spiya korekor heqîqeten spî ye û ne reşa wî heqîqeten reş e. Sewiya korekor naghe wê mertebê ku kari-be spî û reş ji hev bifiriqîne.

Çawa be korekor peyda kiriye û heqîqet di bin çengê wî de ye! Loma tehemula korekor bi kesên ku ne weke wî difikirin re tune ye. Ti derd û dudiliya (tereduda) korekor tune ye ku sibe ji bona tiştê ku îro dike û dibêje û difikire fedîkoyî bimîne. Eslen nafikire ku 'Heger piştî mudetekê ez fam bikim ku tiştê îro ez rast qebûl dikim, ne rast in, ezê çawa li rûyê kesên ku ez îro neheqî li wan

dikim û wan bi derewînûn û neheqbûnê îtham dikim mêzekim?' Lewra korekor bi gumana xwe hê ji îro ve *rasta mutleq* peyda kiriye! Han, sebaba ku dîktator (zordar) hemû bê îstîsna korekor û dogmatîk in jî ev e. Lewra hamû dîktatoran xwe peyda kirî dibînin û wisa hesab dikin. Bi gumana wan, yekane Meryema muxatabî Rûhulquds ew in! Ew tenê bi Mesîhê heqîqetê biheml in û ew tenê karin Mesîhê




heqîqetê bînin dinyayê! Lêbelê ya rastî, zikê wan tişçe qurqur û xurxur e. Ji bil qurqur û xurxurê ti tişt di nava wan de tune ye. Di dîroka (tarîxa) însaniyetê de evan ji bil qurqur û xurxurê ti tiştî ne anîne dinyayê. Han, sebaba ku me vê pirsgirêkê ji ciheta 'bûn û nebûnê' ve girtiye jî ev e. Lewra korekor, rûreşên dîroka însaniyetê ne.

Dijraberî (ziddî) korekor jî, ne zana (alim) ye. Lewra çawa be korekor jî gelek tiştan zane. Zor demegog e korekor. Herî uqela ye. Fitne û fesadî li cem pîrr in. Ma ew korekorên ku di Qur'anê de bi şiklê "kerên kitêb barkirî" hatine wesifandin jî ne 'alim' bûn?! Korekor ne 'nezan' e heta ku neko-rekor 'zana' be! Na; korekor ne nezan e. Korekor ew kese ku îstîdad û qabiliyeta zanayiya xwe kor û kerr dike. Li zanîne nagere û xwe hewcedarî gerê li zanîne hesab nake. Herçi netîca vî halî jî *nezanî* be jî, ferqeke pîrr muhîm di nav nezanî û korekoriyê de heye: Mirovê nezan, kare li zanîne bigere û peyda bike; yanî ev îstîdad û qabiliyet di nefsa nezan de veşartî ye. Lêbelê korekor xwe hewcedarî zanîne qebûl nake. Yanî korekor pêşînen di sinifê de maye.

Ew ne zanişker (şagirt) e ku bizane! Korekor ehmeqeke xêvik e ku xwe mamosta û xoca û dersdar hesab dike.

Li gor baweriya me, dijraberî korekor, *rewşenbîr* e. *Rewşenbîr*, tî û teşneyê av a zanîne ye. 'Mirovê tî li avê digere'; û *rewşenbîr*, herî tî ye û evîndarê av a heyat a zanîne ye. Tim digere *rewşenbîr*; ko peyda bike jî dest ji gerê bernade. Tim dipirse: 'Gelo heqîqeten mi peyda kir?' 'Gelo ji rastiya ku mi peyda kiriye, rast û durusttirî tune ye?' Ere *rewşenbîr* tim di halê pirsê de ye; lêbelê ev hal naye wê manê ku *rewşenbîr* şikdar û şubhedareke îflah nabe ye. Digere ew; rastiya xwe bi rastiye nûza muqayese dike tim. Ji darazdin, ceribandîn, hêjandin û wezîrandina rastiya xwe natirse *rewşenbîr*. Loma, guh dide dîgeran. Dîgeran pêşînen 'alternatîf xelvan' hesab nake; zane ku karin 'alternatîf rastvan' jî bin. Yanî ihtîmal dide vê jî. Loma amadeyî tehqîqa her tiştî ye *rewşenbîr* û mayilî



guh danê ye bi her kesî.

Gelê me gereke çî bike bike, 'çaxa ronahiya xwe', yanî 'çaxa ronesansa Kurdî' biwelidîne û bîne dinyayê. Kesên ku dê mamaniya (ebetiya) vê zayîn û bûyînê

bikin jî, *rewşenbîr* in. Gelê bihemlî Mesîhê xelasker ew gel e ku, bihemlî *rewşenbîran* e.

Zanîn muhîm e helbet. Lêbelê merev bi *xwestina zanîne* dighe *zanîne*; û *rewşenbîr* ewe ku *di-xwaze bizane* û zane hez bike; evîndar e, dilovan e, dadperwer e.

Rewşenbîrên gelê me! Ma hun zanin, kî û çî li benda we ne? Ev gel, gelê Kurd, hezaran sal e ku li benda we ye. Qehra hezaran sala li benda we ye. *Xwîn* û keda *mazlûman* li benda we ya. Welat bi erd û ezmanê xwe, bi dar û gulên xwe û bi her tiştê xwe li benda we ye.

Rewşenbîrên gelê me! Kitêbên he nehatine nivisandin li benda nivisandina we ne. *Tiştên he nehatine kifşkirin* li benda kifş kirina we ne.

Rewşenbîrên gelê me! Ez bi dil û can, heval û hogir û brayê we me. Ez bi hesret çav li rêya we me. ■

Nezanî bes e!

Süleyman Çevik

KURD di welatê xwe de mecbûrê jiyaneke jar û perîşanî bûne. Ji mafên mirovahiyê nesîbê xwe nestandine û jiyana xwe bi esîrî û koletî dom kirine. Ji aliyê emperyalîstan tim û tim carina bi pera, carina bi meqam û rutba û carina jî bi gotinê efsûnkar, belaş hatine xapandin.

Kurdên ku doza welatê xwe kirine û li hemberê zilm û zordariyê sekinîne jî, bi metodên xeyrî însanî doh dihatin kuştin, îro jî têne kuştin.

Çima di nav vê perîşaniya xwe de Kurd bi gotinê emperyalîstan tim tên xapandin? Çima ji brayê xwe re feqa datînin û ji bo kuştina wan xayintiyê dikin? Çima Kurd tim bi hev dikevin? Bi çi niyetê tûrê emperyalîstan dixin histuyê xwe û def û derbeka wan dikutin?

Çima em di vê perîşaniyê de ne?

Kesê ku hinek pêşiya xwe dibîne fam dike ku ev bûyer tev ji nezaniyê tên serê Kurdan. Nezanbûna Kurdan, bûye bindestî û koletiya wan; yanê xapandina wan, qetilkirina wan, talan kirina mal û milkê wan û bi hev ketin û brakujiya wan.

Nezanî di ferhenga de wisa hatiye tarîf kirin:

"Cahilî, ji mesele û weziyetan bê xeber bûn, di ilm û zanyariyê de kêmasî."

Îro ti kes nabêje û nikare bêje ku "nezanî tişteke baş e." Lê mixabin, Kurd ku mîna berê nebe jî, hîna di nezanbûn û hewcedariyê de ne.

Seyda Bedîuzzeman Sêîd


ê Norsî sê dijminan nîşanî me dide: Yek *nezanî* ye, yek *xizanî* ye, yek jî *ixtîlaf* e. Li hemberê van her sê dijminan, sê silahê me yên ku emê bi wan cîhadê bikin hene: Yek *huner* e, yek *zanîn* e, yek jî *ittîfaq* e.

Nezanî; xizanî û îxtîlafa bi xwe re tîne. Kesê nezan dikare hemû xirabiyan bike, xwe bifroşe, heval û hogirê xwe bifroşe û gelê xwe bifroşe.

Mirovê zana, bi sayeta zanabûna xwe, ji nemerddî û xirabiye dûr dimîne.

Gereke em bixwînin, hîn bibin û bi xwendina xwe, kêrî gelê xwe werin. Dema ku em hişyar û zana nebin, emê di nav şemata vê

dinyayê de bi navê xwe û bi çand û huner û edebiyata xwe ve wenda bibin û nikarin ti tiştê xwe biparêzin. Mirov bi xwendina xwe dost û hevalê xwe nes dike û li hemberê dijminê xwe û ramana



wan tedbîrên xwe distîne. Yanê em dikarin bêjin ku rêya zanebûn û pêşveçûnê, bi xwendinê vedibe.

Emra Qur'anê ya pêşin jî, "Bi navê Xwedê bixwîne" ye. Û di ayeteke din de jî, xaliqê alemê Xwedê Teala wisa ferman dike: "Ma tew kesên zana û kesên nezan dibin mîna hev?"

Emra Xwedê bi me, *xwendin* û *hînbûn* e. Mirovê ku dixwîne û zana dibê, li cem Xwedê meqbûl e. Ger em xetta ku Xwedê ji me re daniye bajon û terk nekin, ferzên Îslamê bînin cih û ji gunehên mezin birevin, xwendin û hînbûna me jî îbadet tête qebûl kirin. Wî wextî wê Xwedê ji me razî û memnûn be. Ma ji vê xweştir û bilindtir tiştek din heye?! Bi ser de jî, mirov bi zanabûna xwe, ji bo derdorê xwe û xusûsen ji bo şexsê xwe jî fêde dibîne.

Bi rastî, tiştek biqasî nezaniyê ji mirova re dijmin nîne. Ger mirovê nezan ji bo ku ji nezanbûna xwe

xelas bibe ti zebat û xeyretê neke, wî wextî wê di bin barê bîndestiyê de heta ebed binale. Ti carî jiyaneke birûmet û giranbîha ji xwe re û ji derdorê xwe re peyda nake. Dê mîraseke qirêj û gemarî ji neviyên xwe re bihêle.

Nezanî ji mirova re rêya bîndestiyê vedike.

Bîndestî bîrûmetî ye û kesê ku bibêje "ez misilman im", gereke bîrûmetiyê qebûl neke.

Zanabûn jî ji mirova re rêya azadî û rizgariyê vedike. Azadî û rizgarî jî ji bo însana pêşdetir ji xwarin û vexwarinê ye.

Lazime em hiş û aqlê xwe ji berika axa û began û şêxên sextekar derxin. Ma heta çi wextî emê benê xwe bidin destê wan û li pey wan herin? Heta kîja rojê emê qerar û gotinê ku di heqê me de ne, bi wan bidin gotin û bêjin "axa zane, beg zane, şêx zane"?

Gelo emê çi wextî hişyar û zana bibin? Ma wextê hişyarbûn û zanabûnê nehat? ■

ÎDO Bager

bûn / zanîn / mirin

Îd nizanî Îdo. Zanîna îdê, zanîn e Îdo?

Gelo zanîna îdê ye bûn Îdo?

Îd bûn çiyê nizanîn bû îda Îdo.

Yek Îdo, yek îd, ne îdek bû ne Îdo.

Nizanî Îdo bûn, bê îd bûn e, Îdo.

Ne Îdo bûn zanîna îdê bû, ne zanîna îdê Îdo.

Îdek mirin bû, bûna Îdo. Mirin zanîn bû çiyê Îdo.

Ne îd îdîtiya xwe zanî, ne Îdo.

Mirin, nizanîn bû, nebûn bû.

Îdo nizanîn bû, îda wî nebûn û bûna nizanîn bû.

Bûn bû îd, mirin bû Îdo.

Îd nizanî Îdo.

Zanîna Îdo, îda wî nebûn û bûnê nizanîn bû.

Îdek,

Îdok,

Zanîn û mirinê

Yek zanîn

Yek bûn

Yek mirin bû. ■

Rîsaleya Bratiyê


Naci Abdullah

EV heftê sal in gelê Kurd di bin zilm û tadayiya rejîma Kemalistan de dije. Siyaseta vê rejîma despot ewe ku gelê Kurd ê mazlûm asîmîle bike û zimanê Kurdî pê bide jibîr kirin. Lêbelê gelê Kurd li hemberî vê rejîma despot, cehd û têkoşînek azîm dide û dixwaze ku zimanê xwe muhafaze bike.

Îro rewşenbîrên vî gelî jî dest bi weşandina kitêb, kovar û rojnameyan kirine. Lêbelê heta van nezîkiyan, di nav weşanên piyasê de weşanên Îslamî nedihatînin dîtin. Ev jî misilmanan re kêmasiyek mezin bû. Îro Weşanxaneya nûbihar bi navê misilmanan dixwaze ku vê kemasiyê jî masetê rake.

Weşanxaneya nûbihar kitêbên Îslamiyê Kurdî çap dike û diweşîne. Weşana ewila weşanxanê jî *Rîsaleya Biratiyê* ya Bedîuzzeman Seîd ê Norsî ye.

Bedîuzzeman di nav rîsaleyên xwe de pîrr qîmet daye *Rîsaleya Biratiyê*. Lewra Seîd ê Norsî wextê behsa sê dijminê mezin dike, dibêje 'îxtîlaf jî, yekî jî van dijminayê'. *Rîsaleya Biratiyê* jî jî îxtîlafê re merhemeke pîrr fêdedar e. Loma Seydayê Mela Seîd jî şagirtên xwe xwestiye



ku *Rîsaleya Biratiyê* pîrr zêde bixwînin.

Birayê me Abidîn ê Amedî jî ev naxweşiya di nav misilmanan de dîtiye û ji bona tedawî kirina vê naxweşiyê, *Rîsaleya Biratiyê* ya Bedîuzzeman Seîd ê Norsî wergerandiye zimanê Kurdî. Ev kar, xizmeteke pîrr qenc û delal e. Em vê cehd û xeyreta vî birayê xwe pîroz dikin û jê re spas dikin.

Bedîuzzeman dibêje ku 'xetayên merev mîna dûpişkê ne; wextê hevaleyê bibêje merev, vaye dûpişkek bi histuyê te ve giritiye, lazime merev jî wî hevalî nexeyide û jê re spas bike'.

Ko birayê me Abidîn destûr bide, ez dê li ser wergêra *Rîsaleya Biratiyê* çend tişt bibêjim.

Gelê Kurd niha ne hewcedarî zaravayê herêmî ye. Ji Kurdan re îro zimanê edebiyata Kurdî lazim e; da ku ev ziman, zaravayên herêmiyê muxtelifê Kurdan li hev bîne. Ger ev kar pêk neye, bi zaravayên herêmî û meheli kareke baş naye masetê û gel jî dê ji wê xizmetê kêmtir îstifade bike. Lêbelê birayê Abidîn, *Rîsaleya Biratiyê* bi zaravake herêmî wergerandiye Kurdî. Me bi kîja hevalî re qise kiribe, pêşî jî vî halî rexne kiriye û dûvre jî ji bê rêzimanî û îstifada pîrr zêde ji bêjeyên Tirkî û Erebi û Farsi gazind kiriye.

Yanî werger di wergêra *Rîsaleya Biratiyê* de ji zaravak herêmî îstifade kiriye, bi rêzimana Kurdî bi heddê kafî rîayet nekiriye û bêjeyên biyanî pîrr bi kar biriye. Xwedê arîkarê xwendevan be. Lewra ji bona fam kirina vê rîsaleyê lazime ku merev him Kurdî, him Tirkî, him Erebi û him jî Farsi bizanibe.

Ko em bi kurtasî bibêjin, îstifadeya xelqê jî van kitêbên ku wisa hatine wergerandin, dê pîrr kêmtir be. ■

Nameyên bê cewab / 1

Sabah Kara 30 Îlon 1990

Nizanim ku êdî hespê bê nalê xewê min çi fêdene ji bo min
Ew hespê rehwanê bê qeyd û hefsar çi fêdene ji bo min
Di mêjîyê mi de buraq rabûne şahê yalê wan difirin
Nizanim ku çi fêdene ji bo min, çi fêdene ji bo min

Ev jiyana çawa diherike wisa pîs û lewitî
Em çawa dijin di vê avê de masiyan
Naye fam kirin ku dar çawa karin bijin wisa ser bi xwar
Çima zarok pîrtir têne dinyayê her ro bi tim

Pirsa van jî qebahet e û dînbûn jî bi îznê ve girêdayiye
Çi tişt heye di jiyana me de ku em karin bêjin "ev a me ye"
Bi qasî meşî nemeşî jî bi îznê ve girêdayiye mêzênin
Jiyan li ser her du milê me ariyet e

Em bi jan têne dinyayê ji diyên xwe bi jantir
Bi malîna berxan, ku di zîvinga gur de hatine dinyayê
Xetta qedera me bi diranê tûj têtê kişandin
Ne dengê bilbilan, dengê borezanê romiyan di guhê me dene bi tim

Û şair helbest dinivîsin, ma ka çi fêde
Ka ew şairên ku helbestan nalîn hesab dikin
Laliya cemidiya tirba ye karê wan bi tim
Ax ew helbestê ku dilan dişewitînin ka li kû nin

Ceng e ev îro qehreman tirsok û firarok in
Karewana deveha ye, ker li pêşiya tima
Jehra mara ye dermanê tebîbanê me bi tim
Gerek em neheq bin heta ku em biheq hesab bibin

Di qanûn de heqqê mahfûzê me ye îtaet û ram bûn
Ko helbest ne qedexe be ji ber vê ye muheqqeq
Çi rahet dilerzin postalê romiyan li şûna alan
Û heqqê me koletî ye ji dergûşê heta gorê

Peyivên rastan

29. Tas ser bi jor tişê dibe, kum ser bi jêr.

30. Te çi danî be-roşê, tê wî bixwe.

31. Xwîn bi xwîne naye şuştin, xwîn bi avê tete şuştin.

32. Ko agir bi çiyê ket, ter û hişk pev re dişewitin.

33. Bav harsim dixwe, diranên kur disekihin.

34. Dinya gul e, bêhn bike û bide hevalê xwe.

35. Ko av hat, teyemum batil e.

36. Merd carek dimre, nemerdd hezar car.

37. Delîlê tavê tav e.

38. Giya di bin kevir de namîne.

39. Însan şîrê xav xwarîye.

40. Dengê daholê ji dûr xweş e.

41. Wextê ecel tê, li derî naxe.



42. Ken û girî bra ne.

43. Behsa helawê, dev şêrîn nake.

44. Mûk ji hirç xenîmet e.

45. Yê ku ji hespê Xweda peya be, li kerê şeytan siwar tê.

46. Kufr dom dike, zilm dom nake.

47. Nava merdî û nemerdiyê gavek e.

48. Ko riha xaltîka min hebûna wê biba xalê min.

49. Ko tu dereng hatî zereng wer.

50. Li deryê xelqê nexê da deryê te neşkînin.

51. Pêşî bibe brazî, dû re bixwaz mîrasî.

52. Te anî dinyayê, mezin bike.

53. Bi werîse nemerdd danekeve çalê.

54. Xewa birçiyar naye.

55. Kevir di cihê xwe de giran e.

56. Bra pev diçin, gêj bawer dikin.

57. Ji bo wî bimir ku li ser te bigrî.

58. Şahidê rovî teriya wî ye.

59. Belkî çand in şîn nehat.

60. Mirina dijmin bixwaz da birîndarî qebûl bike. ■

Ko zivistan çû, bihar tê

Siyawêş Kîsrayî / Sabah Kara

ROJEK nêzîkî mexribê hengama ku Apê Nûroj ji karê xwe divegeriya mala xwe, zarokên gund dora

wî girt in û got in:

"Apê Nûroj! Çîrokekê ji me re bibêje."

Apê Nûroj ê ku ne dixwest lavlava zarokan bişkîne, çû li ser qurmekî darê rûnişt û nefesek teze kişand û got:

"Tête bîra min, salan sal berê, wextê ku dê û bavên we hê zarok bûn,

weya hê ji diya xwe ne hatibûn dinyayê, salekî bûyereke ecêbî çêbû:

Zivistana diyarê me temam bû, lê em çiqas li bendê man, bihar nehat.

Her sibeh, dîkan li ser banan bang dikirin, lê bihar nehat.

Gula sor, aciz û dilteng bû, lê nedikarî ji xonçê were derve û kincê spehiyê xwe nîşanî herkesî bide.

Bizinan bi karikên xwe ve,

Di kozikên teng û tarî de, li benda derhatina giya û

sewere bûn û hesreta gerîn û çêrîn di mêrgê de dikşandin.

Xelq ji şibaqê xwe li ezman dimêzandin, Lêbelê ji hecîreşka mizgînvana biharê, ti xeberî nebû.

Umêd Elî yê şivên ji herkesî mahzûntir û xemgîntir bû.

Umêd Elî,

hesreta biharê ji hemû gundiyan zêdetir dikşand û çavê wî li rê bû.

Hemû arezûya wî ew bu ku pezê xwe li dormandorê çiyayê hêşîn biçêrîne û bi newaya bilûra xwe ya heftbendî, laleyên sor ji ber tehtan derbîne.



Kaniya avê nedikarî biherike heta çem û stiran bibêje.

Çiya dixwestin kumê spiyê berfê ji serê xwe bavêjin, lê nedikarîn.

Çêlek bi golikên xwe ve, Miyan bi berxikên xwe ve,

Taliya talî rokê
hewsela Umêd Elî
ji zivistanê teng bû,
ji cihê xwe rabû,
kincê xwe li xwe
kir, gulavdankê ji
dolavê derxist û
berê xwe da çiyê...

Çû û çû û çû...
Heta ku gehîşte
pišta çiyê, cihê ku
hêlîna bayan e.

Gulavdankê he-
jand,

Gulavê bi hewa-
yê ve rijand û ji ba-
yan re got:

"Herin çiya û ço-
listan,

Heye ku hun
hecîreşka qasida
biharê bibînin.

Jê re bibêjin ku
pirr dereng maye."

Bayên ku bi bêhna
gulavê hişyar û bican bûn,
şad û xweşhal berê xwe da-
ne rê,

Ewran ji rûyê ezmên de-
hifandin û çûn,

Çûn, lê mudetkeke dirêj ji
wan ti xeberî nehat.

Hemû tişt cardin bê here-
ket, bê cenbiş, weke xwe
man.

Çiya û dar û mirovan
hemû rawestî biharê bûn;
çavê wan li rê bû.

Rojek di tarîronitiya si-
behê de, şaxê şibaqê ode-
ya Umêd Elî li hev ketin.

Umêd Elî ji cihê xwe hil-
behî,

Dît ku nesîm î seher ne-
fes bi nefes û betilî hatiye
ku:



"Hun çi rûniştine?! Hecî-
reşka qasida biharê di rê de
maye!"

"Çi bûye, çi bûye?!"

"Zarokek şeytanok bi
tîrkevan baskê hecîreşkê
birîndar kiriye."

Umêd Elî rabû, buxçeya
xwe da hev û çû cem gundi-
yan û got:

"Gereke em raperîn û he-
reket bikin; heger na, dê ne
hecîreşk were, ne jî bihar!"

Umêd Elî da pêş û
hevalê wî dan pişt wî û berê
xwe dan rê.

Çûn û çûn... Heta ku
gehîştin cihê ku nesîm î se-
her nişan dabû,

Hecîreşkek dîtî ku li ser
ferşekî, betilî û nivcan keti-
ye û tiştêk nemaye ku ji ser-

ma biqufîle.

Umêd Elî rahişte
hecîreşkê û baskê
birîndarî bi der-
man kir, weke ku
li çiyê berxên bi-
rîndarê xwe bi
derman dikir.

Dawî hecîreşkê di
nava hegala xwe
de pêçand û germ
kir.

Umêd Elî û dost û
hogirên wî tema-
ma şevê li ber
agir, bi nobet ji
hecîreşkê re nêre-
vanî û der-man-
darî kirin.

Roja din sibehê,
birîna hecîreşkê
baş bû û halê wê
hate cih, baskên
xwe vekir û firî.

Du sê cara bi ser serê
wan de çerixî.

Hemû bang kirin:

"Hecîreşk! Naxwe ji vê û
pê de here û biharê bibe
gundê me."

Hecîreşk bi terefê gund
ve firî.

Wextê ku Umêd Elî û
hevalên wî gehîştin gund,
êdî ti eserî ji zivistanê ne
mabû.

Hemû şadî dikirin û her
cih, mîna cenetê, sebz û
hêşîn bibû.

Kaniya avê distirand.

Gula sor, kincê xwe
nişan dida.

Dar direqisîn.

Berxikên nûza, di mêrga
hêşîn de bi bez, lotik didan
xwe.

Gundî, hûçikên xwe bi jor dabûn û dişuxulîn.

Hemû di kar û xebatê de bûn; bihar bû û wextê şuxul û kar bû.

Umêd Elî ji xwe re got:

"Bihar hat, naxwe wext hat."

Kerîya xwe da ber xwe û derkete rê.

Bilûra heftbendiya xwe ji tûrikê derxist û dest bi ne-waya biharê kir.

Ji ber her kevirî laleyek nerm e nerm serê xwe bilind kir. Mîna ku sebzezar bi lembeyan tişê bibû û her lale, bibû lembek.

Nêzîkî mexribê hecî-reşkin din jî ji rê ve hatin. Cot e cot li xaniyên gund belav bûn, da ku di banê xaniyan de ji xwe re hêlînin hazir bikin...

Zarokê min! Ez hêvîdar im ku hun navê wî zarokê şeytanokê ku baskê hecî-reşkê şkenandibû ji min nepirsin!

Ma êdî ez çî bikim? Pîrî ye û jibîr kirinî!"

Çîroka Apê Nûroj xilas bû.

Zarokên şad û bi kêf, yek bi yek ji Apê Nûroj xatir xwestin û mîna hecî-reşkên mêvan, bi terefê xaniyê gund de baz dan. ■

Bi navê Yezdan

Hevalno,
Ko em jînenigariya Pêxemberê xwe mêzekin emê rastê rêxistinek bi navê **Hulful Fudûl** werin.

Di wê demê de Pêxemberê me bi xwe jî, li dijî zilmê dinav vê rêxistinê de cih girtiye.

Peyman û biryara rêxistina **Hulful Fudûl** jî wisa bû:

"Wellaî ji nuha şunde li Mekkê, dixwaze kesê xwecih be, yan biyanî be, yê ku lê zilm û zordestî tê kirin, emê nehêlin. Emê tucar qadê nedin zilmê. Heta ku mafê mazlûman ji zaliman were standin, emê bi mazlûman re bin. Hetâ ava behran qasî mûkê şil bike hebe û çiyayên Hira û Sebirê di cihê xwe de bin, emê li ser vê peyman û biryara xwe bin."

Hevalno,

Werin em jî weke wan mirovên delal û dilsoz, peyman û biryar bidin xwe ku, heta ev zilm û zordestî ji ser ax û gelê me rabe û heta ku dewletek li gor daxwaza Yezdan li Kurdistanê were avakirin, emê bi hev re li dijî zilm û zordestiyê têkoşîn bikin û emê nerawesin. ■

Heqperest/Amed

Daxwaz

Ji bo serxwebûn
Divête yekbûn
Em jî wek gelan
Bijîn li gerdûn

Daxwaza me ev
Gelê bîndest tev
Ji bo xelasyê
Dest bidin herhev

Hêzên dagirker
Girt in seranser
Ey Kurdên reben
Wanan têxin der

Welatê şêrîn
Geş û xemilîn
Li ser şerîet
Emê damizrin

Kurdistana xwe
Bikin serbixwe
Dijmin derbixin
Têkin warê xwe

Ebdillah Amed

Kovara nûbihar

Mizgîniyek şêrîn hate guhê min:
Kovara nûbihar tête weşandin
Sivik bûn keser û kul û derdê min
Birînê dilê min hatin kewandin

Kovara nûbihar ser seran hatî
Pirr xêr û şahiyî ser çavan hatî
Çarmandor Kurdistan em bendeman
bûn
Lê şikir Xweda re tu îro hatî

Nûbihara me kovarek delal e
Lewra armanca wê Îslama zelal e
De misilmanno zendê xwe bilindkin
Ko em jê re nebin pale webal e

Em dengê Îslamê b'Kurdî belavkin
Milletê cîhanê tev de hişyarkin
Huseynên hemdemî dem dema me ye
Dereng e bindestan em xewê rakin

Kovara nûbihar gelek hêja ye
Qudret û nusreta Xweda pê re ye
Xebatkarên wêna tim şîrhelal in
Rewşenbîrên jîr û xortên delal in

M. Şakir ê Koçer

Rîde tod, vilî abyenê

-qandê a keyna werdî-

Dawara xebera to çinya hana
Çimê toyê werdî, ewnanê mira

Ti hana nêzana welat pay biyo
Zordestî bindo tim, gunî bermeno

Dest nêgnayo toro, ti çend mehsuma
Ti Qur'an wazena çimandê xuya

Ti yena mi vîrî, ez çend qahryena
Ê do to gird kerê, bi xirabeya

Rîdê toyê pakîd, vilî abyenê
Çimê to dinyayrê rindey ders danê

Ala Îslamî bo to sero çarçef
Hukm ê Homa'y torêwa bibo şeref

Muhammed Paşa / Siverek

Hey Melekent

Tarîxa gund kevn e gelek
Şahîdê vê Birc a Belek
Hey Melekent hey Melekent
Tev tarîx e her kevîrek

Hezar sal e gund ava ye
Cihê feqî û mela ye
Hey Melekent hey Melekent
Te nav ji melan hilda ye

Mizgeft medrese nişan in
Alimê me pîr zîşan in
Hey Melekent hey Melekent
Ew nebin em perîşan in

Gundên Adgon Riyong û Lîz
Li nava wan weke nergîz
Hey Melekent hey Melekent
Dilê me re bûyî nafîz

Ava Lîzê xweş dikişê
Nava dilê min naxweş e
Hey Melekent hey Melekent
Ev çî derd e ev çî êş e

Li kêleka Bilêcan î
Evîna keç û xortan î
Hey Melekent hey Melekent
Tu ji derda re derman î

Hundirê gund de goristan
Dev dorê çem bax û bûstan
Hey Melekent hey Melekent
Tu gulekî li Kurdistan

Her xortek te weke Şehbaz
Her keçek te mîna Şennaz
Hey Melekent hey Melekent
Ji eşqa te bûne perwaz

Gundê min ê xweş û delal
Xelqê tê de dost û heval
Hey Melekent hey Melekent
Ji kerbê te bûme melal

Necip Yüce

Raya ma

Koya sero herb kenê
Qur'an ma vero rehber.
Tîjya şefaqî nika,
Akewna qelbdê ma ser.

Ma wazenê şehadet,
Cîhad emrê Homa'yo
Ariq, hêrs u gunyama
Wa na raydi birijyo.

Na rayd serê ma şiro,
Bedenê ma lete bo,
Ma nê ageyrenê peyd
Dinya marê dijmin bo.

Dinya'd çimê ma çinyo,
Raya ma, raya Homa'y,
Wa feda bo ganê ma,
Ma gunya xu dê na ray.

Muhammed Paşa
(Siverek)

Elfabeya Kurdî

| | | |
|-----|-----------|-----------------|
| A a | Agir | Ateş |
| B b | Baran | Yağmur |
| C c | Ceh | Arpa |
| Ç ç | Çav | Göz |
| D d | Dest | El |
| E e | Evîn | Aşk, sevgi |
| Ê ê | Êzing | Odun |
| F f | Felek | Felek |
| G g | Gund | Köy |
| H h | Hawar | İmdat, çağrı |
| I ı | Iwaraş | Kasirga |
| Î î | Îsot | Biber |
| J j | Jale | Çiy, şebnem |
| K k | Keskesor | Gökkuşağı |
| L l | Lehî | Sel |
| M m | Mehîn | Kısrak |
| N n | Nan | Ekmek |
| O o | Oflaz | Sevimli, mağrur |
| P p | Paqij | Temiz |
| Q q | Qalind | Kalın |
| R r | Rewşenbîr | Aydın |
| S s | Senger | Siper, mevzi |
| Ş ş | Şêr | Aslan |
| T t | Tolik | Ebegümeçi |
| U u | Umêd | Umut |
| Û û | Ûlî | Köşk |
| V v | Virr | Yalan |
| W w | Wawîk | Çakal |
| X x | Xox | Şeftali |

| | | |
|-----|--------|--------------|
| Y y | Yezdan | Allah, Tanrı |
| Z z | Zozan | Yayla |

Di elfabeya Kurdî de 31 tîp henin. 23 heb ji wan tîpan *dengdar* in; yanî bi serê xwe deng der-naynin û ji ber vê, ji wan re *dengdar* tête gotin. Hin cîhan de jî, ji wan tîpan re *bêdeng* dibêjin, lê ev nav ne rast e; lewra hîç tîpek bêdeng nabe; gava ku bêdeng be ne hewce ye em navê wan binivîsin. Lêbelê ev tîp bi serê xwe deng nadin; divêt bi arîkariya dengdêrekî bêne xwendin.

8 heb ji tîpên elfabeya me jî *dengdêr* in; yanî bi serê xwe deng didin. Ev jî du birr in:

1- *Dengdêrên dirêj*: a, ê, î, o, û.

2- *Dengdêrên kin*: e, i, u.

Tîp li gor nivîsandina xwe jî bi du awayî nin:

1- *Girdek*: Ji tîpên mezin re em dibêjin *girdek*. Mîna: A, B, C.

2- *Hûrdek*: Ji tîpên piçûk re em dibêjin *hûrdek*. Mîna: a, b, c.

Kîte

Tîp bi tenê yan ligel hev *kîte* pêk tînin. Kîte, deng an bêjeyeke ku bi derbekê ji devê merev der tê û ev kîte, *bêje* çêdikin.

Du cûr *kîte* henin. Bêjeyên ku bi yek kîte çêdibin, em ji wan re *yekkîte* dibêjin û yên ku ji du yan zêdetir kîte pêk tînin, *pirkîte* ne. *Av, roj, dil* û yên wisa, *yekkîte* ne; *welat, mirov, Kurdistan* û yên wisa jî, *pirkîte* ne.

Bêje

Bêje ji yek an çend kîteyan pêk tê û bi serê xwe manekî dide. Mîna: *Elî, sar, Hesên, kenîn, şêrîn* û hwd.

Pevdeng

Zimanê me de yek *pevdeng* heye, ew jî "xw" ye. Hemû bêjeyên ku dengê "xu-wa" didin, bi wan du tîpan tînin nivîsandin. Mîna *xwendin, xwîn, xwarin*.

Jimar

Jimar, nav û nivîsandina hejmaran an reqeman e. Çend û çiqas bûna tiştan bi me didid nasîn. Nav û nivîsandina wan li jêr hatine rêz kirin:

a) Qisma yekem

| | | |
|-----|--------------|-------------------------|
| 1 | Yek | Yekem, yekemîn |
| 2 | Du, dudu | Duyem, duyemîn |
| 3 | Sê, sisê | Sêyem, sêyemîn |
| 4 | Çar, çihar | Çarem, çaremîn |
| 5 | Pênc | Pêncem, pêncemîn |
| 6 | Şeş | Şeşem, şeşemîn |
| 7 | Heft | Heftem, heftemîn |
| 8 | Heşt | Heştem, heştêmîn |
| 9 | Neh | Nehem, nehemîn |
| 10 | Deh | Dehem, dehemîn |
| 11 | Yanzdeh | Yanzdehemîn |
| 12 | Duwazdeh | Duwazdehemîn |
| 13 | Sêzdeh | Sêzdehemîn |
| 14 | Çardeh | Çardehemîn |
| 15 | Panzdeh | Panzdehemîn |
| 16 | Şanzdeh | Şanzdehemîn |
| 17 | Hefdeh | Hefdehemîn |
| 18 | Heşdeh | Heşdehemîn |
| 19 | Nozdeh | Nozdehemîn |
| 20 | Bîst | Bîstemîn |
| 21 | Bîst û yek | Bîst û yekemîn |
| 22 | Bîst û du | Bîst û duyemîn |
| 30 | Sî, sih | Siyemîn |
| 31 | Sî û yek | Sî û yekemîn |
| 40 | Çel, çil | Çelemîn, çilemîn |
| 43 | Çel û sê | Çel û sêyemîn |
| 50 | Pêncî, pênce | Pênciyem pênceyemîn |
| 54 | Pêncî û çar | Pêncî û çaremîn |
| 60 | Şêst | Şêstemîn |
| 61 | Şêst û yek | Şêst û yekemîn |
| 70 | Heftê | Heftêmîn, hefteyemîn |
| 80 | Heştê | Heştêmîn, heşteyemîn |
| 90 | Nod | Nodemîn |
| 100 | Sed | Sedemîn |

| | | |
|------|--|------------------|
| 109 | Sed û neh | Sed û nehemîn |
| 200 | Dused | Dusedemîn |
| 225 | Dused û bîst û pênc Dused û bîst û pêncemîn | |
| 1000 | Hezar | Hezaremin |
| 1005 | Hezar û pênc | Hezar û pêncemîn |
| 1120 | Hezar û sed û bîst Hezar û sed û bîstemîn | |
| 1999 | Hezar û nehsed û nod û neh | |

û hwd.

b) Qisma duyem

| | | |
|------------|--------------|----------------|
| Yekan | Yekî | Her yek |
| Duduyan | Duduyî | Her du |
| Sisiyan | Sisêyî | Her sê |
| Çaran | Çarî | Her çar |
| Pêncan | Pêncî | Her pênc |
| Şeşan | Şeşî | Her şeş |
| Heftan | Heftî | Her heft |
| Heştan | Heştî | Her heşt |
| Nehan | Nehî | Her neh |
| Dehan | Dehî | Her deh |
| Yanzdan | Yanzdehî | Her yanzdeh |
| Duwazdan | Duwazdehî | Her duwazdeh |
| Sêzdan | Sêzdehî | Her sêzdeh |
| Çardan | Çardehî | Her çardeh |
| Panzdan | Panzdehî | Her panzdeh |
| Şanzdan | Şanzdehî | Her şanzdeh |
| Hevdehan | Hevdehî | Her hevdeh |
| Hejdehan | Hejdehî | Her hejdeh |
| Nozdehan | Nozdehî | Her nozdeh |
| Bîstan | Bîstî | Her bîst |
| Bîst û yek | Bîst û yekan | Her bîst û yek |
| Sîhan | Sîhî | Her sîh |
| Çelan | Çelî | Her çel |
| Dusedan | Dusedî | Her dused |
| Hezaran | Hezarî | Her hezar ■ |

| | |
|-----------------------------------|-----------------------------------|
| A | C |
| Al: Bayrak. | Cenbiş: Hareket. |
| Awa: Tarz. | Cûr: Tür. |
| B | Ç |
| Bandûr: Tesir, etki. | Çand: Kültür. |
| Ben: İp. | Çaplûsî: Yağcılık. |
| Berevajî: Karşı, zıt. | Çapxane: Matbaa. |
| Berg: Kapak. | Çiriya paşin: Kasım ayı. |
| Berhevok: Seçki, derleme. | Çirok: Masal. |
| Berik: Cep. | D |
| Berqasa: Şimşekvari. | Dad: Adalet. |
| Bersiv: Cevap. | Dadperwer: Haksever, adil. |
| Beş: Bölüm. | Dagirker: İşgalci. |
| Bêje: Kelime. | Damizrandin: Kurmak. |
| Bêrûmetî: Şerefsizlik. | Daraz dan: Yargılamak. |
| Bider kirin: Çıkarmak. | Daxwaz: İstek, talep. |
| Bihîşt: Cennet. | Dengdar: Ünsüz (Gramerde). |
| Bindestî: Esaret, kölelik. | Dengdêr: Ünlü (Gramerde). |
| Birr: Kısım, bölüm. | Dermandar: Sağlık gö- |
| Biryar: Karar. | |
| Biyani: Yabancı. | |
| Bûyer: Olay, olgu. | |

| |
|------------------------------------|
| revlisi. |
| Dij: Karşıt. |
| Dijraberî: Karşıtlik. |
| Dilnizm: Alçakgönüllü. |
| Dilovanî: Merhamet, şefkat. |
| Dilsoz: Sadık, güvenilir. |
| Dolav: Dolap. |
| Doz: Dava. |
| Dûpişk: Akrep. |

| |
|--|
| E |
| Eve: İşte. |
| Evin: Sevgi. |
| F |
| Faizkerî: Faizcilik, tefecilik. |
| Feq: Tuzak. |
| Ferhengok: Küçük sözlük, lügatçe. |
| Ferîşte: Melek. |

| |
|-------------------------------------|
| G |
| Gel: Halk. |
| Gerdûn: Dünya. |
| Girdek: Büyük harf. |
| Giring: Önemli. |
| Giyajehrin: Baldıran zehiri. |
| Gulav: Gül suyu. |
| Gulavdank: Gül suyu şişesi. |

| |
|---------------------------------|
| H |
| Han: İşte. |
| Hatî: Gelen, gelecek. |
| Hecîreşk: Kırlangıç. |
| Hegal: Atkı. |
| Hejmar: Sayı. |
| Hekîm: Filozof. |
| Helbest: Şiir. |
| Hevraman: Fikirdaş. |
| Herêmi: Bölgesel, yerel. |
| Hergiz: Hiçbir zaman. |
| Hewcedarî: İhtiyaç. |
| Hêjandin: Değerlendirme. |
| Hêlin: Yuva, kuş yuvası. |
| Hêsanvan: Kolaycı. |

| |
|---|
| Hêşin: Yeşil. |
| Hêvidarî: Beklenti, rica. |
| Hêz: Güç, kuvvet. |
| Hilbehîştin: Sıçramak, irkilmek. |
| Hilbijartin: Seçmek. |
| Hirkur: Öz evlat. |
| Hişyar: Uyanık, bilinçli. |
| Hîn bûn: Öğrenmek, anlamak. |
| Hogir: Yoldaş. |
| Huner: Sanat. |
| Hûçik: Yen, elbise yeni. |
| Hûrdek: Küçük harf. |
| hwd: Vesaire anlamındaki her wekî din in kısaltması. |

| |
|-------------------------|
| Î |
| Îd: Bayram. |
| Îlon: Eylül ayı. |

| |
|--------------------------------------|
| J |
| Jan: Sancı, sızı, ağrı. |
| Jeng: Pas. |
| Ji bil: Başka. |
| Jimar: Rakam, numara. |
| Jiyan: Hayat. |
| Jiyanname: Biyografi. |
| Jîndar: Canlı. |
| Jînenigarî: Sîret, biyografi. |
| Jîr: Zekî, akıllı. |

| |
|---|
| K |
| Kamiranî: Başarı, zafer. |
| Karpêk: Eser. |
| Karpêkên şandî: Okuyucu gönderileri. |
| Kerî: Sürü. |
| Kêrî hatin: İşe yaramak. |
| Kinc: Elbise. |
| Kîte: Hece. |
| Kovar: Dergi. |

| |
|--------------------------------------|
| L |
| Lava kirin: Rica etmek. |
| Lêpîrsîn: Soruşturma. |
| Ligel hev: Birlikte, beraber. |

ABONE KARTI

Lütfen beni [.....] sayısından itibaren **nûbihar** dergisine abone kaydedin.

Adım ve Soyadım:

Adresim:

Abone bedelini yatırmak için banka hesap numaraları:

Yurt içi: Süleyman Çevik, İş Bankası Yavuzselim Şubesi, 1079 - 300 - 235999

Yurt dışı: Süleyman Çevik, İş Bankası Yavuzselim Şubesi, 1079 - 30100 - 3118770

Lütfen bu kartı doldurup abone bedelini yattırdığınızı gösteren makbuzun bir kopyasıyla birlikte adresimize gönderiniz.

Adres:

Fevzipaşa Cad. Başhoca Sok. No: 49/1
Fatih - İstanbul Tel: 533 75 88

Abone bedeli:

Yurt içi: 90.000 TL. **Yurt dışı:** 40 DM.

M

Maf: Hak.
Mamosta: Hoca, öğretmen.
Mehanî: Aylık.
Mehname: Aylık yayın organı.
Mêrg: Mera, otlak, çayır.
Mijar: Konu, mevzu.
Mîna: Gibi.
Mînak: Örnek.

N

Name: Mektup.
Nesîm î seher: Sabah yeli.
Newa: Ezgi.
Nevî: Torun.
Nêrevan: Hasta bakıcı.
Nijadperest: İrkçı, milliyetçi.
Nivîs: Yazı.
Nivîsar: Makale.
Nivîskar: Yazar.
Nûbihar: Turfanda.
Nûroj: Nevruz, "yeni gün", baharın ve Kürt yılının ilk günü, 21 Mart.
Nûza: Yeni doğmuş, bebe.

P

Parastin: Korumak.
Paşveçûn: Gerileme, gericilik.
Pevdeng: Tek ses veren iki harf.
Peyman: Anlaşma, sözleşme.
Pêşgotin: Önsöz.
Pêşi: Sivrisinek.
Pêşniyar: Öneri.
Pêşveçûn: İlerleme, ilerlilik.
Pirkîte: Çok heceli.
Pirsgirêk: Sorun.
Pirsgirêka Kurdan: Kürt sorunu.

Pirsiyar: Soru.
Pirtûk: Kitap.
Pirole: Abartılı, abartıcı.

Q

Qad: Yer, alan, meydan.
Qaj: Karga.
Qedexe: Yasak.
Qise: Öykü.

R

Ragehiştin: Erişmek, ulaşmak.
Raman: Fikir.
Raperîn: Ayaklanmak, sıçramak, atlamak.
Rawestan: Durmak.
Ray: Oy, görüş.
Rewşenbîr: Aydın.
Rexne: Eleştiri.
Rêk xistin: Düzenlemek.
Rêşaş: Sapık.
Rêziman: Dilbilgisi.
Rizgarî: Kurtuluş, bağımsızlık.
Rojname: Günlük yayın organı, gazete.
Romî: Asker, Türk askeri.
Rûpel: Sayfa.

S

Sazûman: Teşkilat.
Serhildan: Başkaldırı.
Sernivîs: Manşet, yazı başlığı.
Sernivîsar: Başyazı, başmakale.
Serxwebûn: Bağımsız olmak.
Serrastkirin: Düzeltmek, düzenlemek.

Ş

Şandên xwendevanan: Okuyucu gönderileri.
Şandî: Gönderi.

T

Taybetî: Özel.
Têkoşîn: Mücadele.
Tixûb: Sınır.
Tip: Harf.
Tirkevan: Yay, ok yayı.

V

Vekolîn: Yorum.

W

Werger: Çevirmen.
Wergerandin: Çevirmek.
Wergêr: Çeviri.
Weşan: Yayın.
Weşandin: Yayımlamak.
Weşanname: Yayınları değerlendirme ve eleştirme bölümü.
Wije: Edebiyat.

X

Xapandin: Aldatmak.
Xatirxwestinî: Veda.
Xêvik: Budala, salak.
Xizanî: Yoksulluk, yoksunluk.
Xoşdîtinî: Hoşgörü.
Xwecih: Yerli, yerleşik.
Xwendegeh: Okul.
Xwendevan: Okur, okuyucu.

Y

Yekkîte: Tek heceli.

Z

Zanyar: Alim, bilgin.
Zanyarane: Bilimsel.
Zarava: Lehçe.
Zend: Bilek, yen.
Zirkur: Üvey evlat.
Ziving: İn, mağara.
Zordestî: Diktatörlük. ■

KARTA ABONETİYÊ

Ji kerema xwe ve ji hejmara [.....] pê ve min bikin aboneya/aboneyê kovara **nûbihar**.
Nav û paşnav:
Navnîşan:

Jimareyên hesabbankî ji bona razandina bedela abonetiye:

Li hundur: Süleyman Çevik, İş Bankası Yavuzselim Şubesi, 1079 - 300 - 235999

Li derve: Süleyman Çevik, İş Bankası Yavuzselim Şubesi, 1079 - 30100 - 3118770

Ji kerema xwe ve Karta Abonatiye dagirin û tevî kopiyeye pela razandina bedela abonetiye bişînin navnîşana me.

Navnîşan:

Fevzipaşa Cad. Başhoca Sok. No: 49/1
 Fatih - İstanbul Tel: 533 75 88

Bedela abonetiye:

Li hundur: 90.000 TL. **Li derve:** 40 DM.

**gündeminizde
bizim adımız var !**

***nû*bihar**

ŞIRNAK BASKINI

çıktı... (20.000 TL.)

Günümüzde

İSLAM ve
KÜRTLER

yakında...

toplu
isteklerinizde
% 40 indirim
uygulanacaktır.

***nû*bihar** yayınları

Fevzipaşa Cd. Başhoca Sk. 49/1

Fatih - İstanbul

Tel: 533 75 88

